



Nihêniya hilbijartinê dema deng didî

Hilbijartinên li Swêdê azad, nihênî û yekser in. Nihênîtî tê wê maneyê ku ne pêwîst e ku tu ji kesekî re bibêjî ka te çawa deng daye. Ti kesekî din nikare biryarê bide ka divê tu çawa dengê (raya) xwe bikar bînî.




Dema pusûleya dengdanê werdigirî bi tena serê xwe yî

Pusûleya denganê li pişt perdeyekê ye, ji bo ku bêyî ku kesek din bibîne wê bigirî. **Dema ku pusûleya dengan ya xwe digirî divê tu bi tenê bî.**



Li pişt perdeyê bi tena serê xwe

Dema te pusûleya denganê ya xwe wergirt divê tu dengê xwe amade bikî. **Wê demê divê tu li pişt perdeyê bi tena serê xwe bî.**



Ti kesek nikare dengê (raya) te bişopîne

Piştî ku te dengê xwe amade kir tu dê vê bidî wezîfedarên dengwergirtinê û ew dê vê bi awayeke ewle hilînin. Dema dengê te tê jimartin dê ti kesek nikaribe bişopîne ku deng ji aliyê te ve hatiye dayîn.

Tenê eger kêmendamiyek te yan tiştek wekî wê hebe tu dikarî ji ber pêwîstiyê kesekî bi xwe re bibî pişt perdeyê ku dikare ji bo wergirtina pusûleya dengdanê yan amadekirina dengê te bi te re bibe alîkar.

Pirsên te hene?

Têkilî bi Komîsyona Hilbijartinê (valnämnd) ya şaredariya xwe re dayne yan serî li malpera www.val.se bide.